

T.C.
Bingöl Üniversitesi
Yaşayan Diller Enstitüsü
Zaza Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**ZAZACADA FİİL YAPI VE ÇEKİMİ ÜZERİNE
BİR İNCELEME**

Perîhan DEMÎR

132301101

Tez Danışmanı

Doç. Dr. Mustafa KIRKIZ

Bingöl-2015

K.T.
Unîversîteya Çewlîg
Enstîtuya Ziwanê ke Cuyenî
Şaxê Zanistî Bingeyî yê Edebiyat û Ziwanê Zazakî

Tezê Masterî

ZAZAKÎ DE DERHEQÊ AWANÎ Û ANTIŞÎ YÊ
KARÎ SER YEW CIGÊRAYÎŞ

Perîhan DEMÎR

132301101

Şêwirmend


Doç. Dr. Mustafa KIRKIZ


Çewlîg - 2015


Örnek 2: Tez Onay Sayfası İçeriği

Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğüne

Bu çalışma jürimiz tarafından Zaza Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak kabul edilmiştir.


Başkan (imza)
: Prof.Dr. Hasan ÇİFTÇİ 

Danışman (imza)
: Doç.Dr. Mustafa KIRKIZ 

Üye (imza)
: Yrd.Doç.Dr. Ercan ÇAĞLAYAN 

Onay

Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.

İmza
Prof.Dr. Hasan ÇİFTÇİ 
Enstitü Müdürü

TEDEYÎ

TEDEYÎ	I
ÖZET	VI
ABSTRACT	VII
VATEYO VERÊN	VIII
LÎSTEYA TABLOYÎ	IX
KILMNUŞTEYÎ	XII
DESTPÊK	1
QISMO YEWIN	11
1.1.Pênaseyê Karî	11
1.2.Zazakî de Qertafê Mesderî	14
1.3. Zazakî de Hete Awanî ra yê Etudkerdişê Karan	17
1.3.1. Karan de awanî.....	17
1.3.1.1. Zazakî de Karê Sadeyî	19
1.3.1.2. Zazakî de Karê Pêrabesteyî	22
1.3.1.2.1. Karê pêrabesteyî ke formê name+kar de virazîyênî.....	24
1.3.1.2.2. Karê pêrabesteyî ke formê sifet+kar de virazîyênî.....	27
1.3.1.2.3. Karê pêrabesteyî ke formê karo ardimkerdox+kar de virazîyênî.....	29
1.3.1.2.4. Karanê pêrabesteyî ke bi manaye besyayî/manadaro îdyomin ra virazîyênî.....	36
1.3.1.2.5. Karanê pêrabesteyî ke akîs ra virazîyênî.....	39
1.3.1.3. Zazakî de Karê Viraşte	41
1.3.1.3.1. Bi prefîksê yewheceyînan ra kare viraşteyî.....	42
1.3.1.3.2. Bi prefîksê zafheceyînan ra karê viraşteyî.....	48
QISMO DIYÎN	52
2.1. Derheqê Antişê Karî de Zanayiş	52
2.2. Kar de Rawe	53
2.3. Kar de Dem	54
2.4. Kar de Kesî	54
2.5. Zazakî de Raweyê Xebere	55
2.5.1. Zazakî de Demo Nikayin/Demo Hîra	55

2.5.1.1. Demo nikayîn/hîra de antişê karo sadeyi.....	57
2.5.1.2. Demo nikayîn/hîra de antişê karê pêrabesteyî.....	59
2.5.1.2.1. Demo nikayîn/hîra de antişê karanê pêrabestayî ke şekilê name+kar de virazîyenî ..	59
2.5.1.2.3. Demo nikayîn/hîra de antişê karanê pêrabesteyî ke şekilê karo ardimkerdox+kar de virazîyenî ..	63
2.5.1.2.4. Demo nikayîn/hîra de antişê karanê pêrabesteyî ke bi manaye besyayî/manadaro îdyomin ra virazîyenî.....	66
2.5.1.2.5. Demo nikayîn/hîra de antişê karanê pêrabesteyî ke akîs ra virazîyenî.....	68
2.5.1.3. Demo nikayîn/hîra de antişê karo viraşte ..	69
2.5.1.3.1. Demo nikayîn/hîra de antişê bi prefîksê yewheceyînan ra kare viraşteyî ..	69
2.5.1.3.2. Demo nikayîn/hîra de antişê bi prefîksê zafheceyînan ra kare viraşteyî ..	71
2.5.2. Zazakî de Demo Ameyox ..	72
2.5.2.1. Demo ameyox de antişê karo sadeyî ..	72
2.5.2.2. Demo ameyox de antişê karo pêrabesteyî ..	74
2.5.2.2.1. Demo ameyox de antişê karê pêrabesteyî ke şekilê name+kar de virazîyenî.....	74
2.5.2.2.2. Demo ameyox de antişê karê pêrabesteyî ke şekilê sifet+kar de virazîyenî ..	76
2.5.2.2.3. Demo ameyox de antişê karê pêrabesteyî ke şekle karo ardimkerdox+kar da virazîyenî ..	77
2.5.2.2.4. Demo ameyox de antişê karanê pêrabesteyî ke bi manaye besyayî/manadaro îdyomin ra virazîyenî.....	82
2.5.2.2.5. Demo ameyox de antişê karanê pêrabesteyî ke akîs ra virazîyenî ..	83
2.5.2.3. Demo ameyox de antişê karanê viraşte ..	84
2.5.2.3.1. Demo ameyox de antişê bi prefîksê yewheceyînan ra kare viraşteyî ..	84
2.5.2.3.2. Demo ameyox antişê bi prefîksê zafheceyînan ra kare viraşteyî.....	86
2.5.3. Zazaki de Demo Vîarteyo Dîyar.....	87
2.5.3.1. Demo vîarteyo dîyar de antişê karê sadeyî.....	88
2.5.3.2. Demo vîarteyo dîyar de antişê karê pêrabesteyî.....	90
2.5.3.2.1. Demo vîarteyo dîyar de antişê karê pêrabesteyî ke şekilê name+kar de virazîyenî ..	90
2.5.3.2.2. Demo vîarteyo dîyar de antişê karê pêrabesteyî ke şekilê sifet+kar de virazîyenî...	91
2.5.3.2.3. Demo vîarteyo dîyar de antişê karê pêrabesteyî ke şekle karo ardimkerdox+kar de virazîyenî ..	92
2.5.3.2.4. Demo vîarteyo dîyar de antişê karanê pêrabesteyî ke bi manaye besyayî/manadaro îdyomin ra virazîyenî.....	95

2.5.3.2.5. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karanê pêrabesteyî ke akîs ra virazîyenî.....	96
2.5.3.3. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karanê viraşte.....	97
2.5.3.3.1. Demo vîyarteyo dîyar deantişê bi prefîksê yewheceyînan ra kare viraşteyî	97
2.5.3.3.2. Demo vîyarteyo dîyar de antişê bi prefîksê zafheceyînan ra kare viraşteyî	98
2.5.4. Zazakî de Demo Vîyarteyo Nêdîyar.....	100
2.5.4.1. Demo vîyarteyo nêdîyar de antişê karê sadeyî	100
2.5.4.2. Demo vîyarteyo nêdîyar de antişê karê pêrabesteyî	102
2.5.4.2.1. Demo Vîyarteyo nêdîyar de antişê karê pêrabesteyî ke şekilê name+kar devirazîyenî	102
2.5.4.2.2. Demo vîyarteyo nêdîyar de antişê karê pêrabesteyî ke şekilê sifet+kar de virazîyenî	102
2.5.4.2.3. Demo vîyarteyo nêdîyar de antişê karê pêrabesteyî ke şekle karo ardimkerdox+kar de virazîyenî.....	103
2.5.4.2.4. Demo vîyarteyo nêdîyar de antişê karanê pêrabesteyî ke bi manaye besyayî/manadaro îdyomin ra virazîyenî.....	106
2.5.4.2.5. Demo vîyarteyo nêdîyar de antişê karanê pêrabesteyî ke akîs ra virazîyenî.....	107
2.5.4.3. Demo vîyarteyo nêdîyar de antişê karanê viraşte.....	108
2.5.4.3.1. Demo vîyarteyo nêdîyar deantişê bi prefîksê yewheceyînan ra kare viraşteyî.....	108
2.5.4.3.2. Demo vîyarteyo nêdîyar de antişê bi prefîksê zafheceyînan ra kare viraşteyî	109
2.6. Zazakî de demo pêrabestayîdar/karê rawedar yê pêrabeste.....	111
2.6.1.1. Zazakî de demo vîyarteyo nikayîn û hîra	111
2.6.1.2. Zazakî de demo vîyarteyo nîyefîn	114
2.6.1.3. Zazakî de demo vîyarteyo nedîyaro veren.....	116
QISMO HÎRÊYÎN.....	118
3.1. Zazakî de Raweya Waştîşî.....	118
3.1.1. Raweya waştîşî.....	119
3.1.2. Hîkayeya raweya waştîşî.....	122
3.1.3. Raweya ganîyîye	124
3.1.4. Hîkayeya raweya ganîyîye	126
3.1.5. Raweya şertî.....	128
3.1.6. Hîkayeya raweya şertî.....	131
3.1.7. Raweya fermanî.....	133
NETÎCE.....	136
ÇIMEYÎ.....	139

XULASA

Xebate de Zazakî de bi etudbîyayîşê sey viraşte yê karan, deman de û raweyan de demo ke şî antiş, cigêrayîşê bedilîyayîşo ke vîyarna yo armanç beno. Verê her çî derheqê karî de zanayîş dayo dima esas leteyê babeta karî yo, derheqê qertafê mesderî de ca dayo îzahatan.

Xebate de karê ke ziwane rojane de zaf cayan de yenê şuxulnayîş tercîh bî. Zazakî de hetê viraştişî ra karî; sey sade, pêrabeste û viraşte hîrê qismeyan de etud bî. Qismê derheqe deman de antişî yê karan de raweyanê xeberan û şertan de serê karan de vindetê. Xebata ma de; karan de semedo ke warê sîwane yê, serê rewşanê transîtif-întransîtif û aktîf-passîf de nêvindetîyayê. Qismê şîyayîşî de girîngîya ziwani, derheqê ziwani de ziwani senî vejîyayo de dîyayîşî, cuya komelkî de qalê babetanê ziwani kerdo û xebatê ke serê Zazakî rê virazîyayê ca dayo înan. Derheqê nê xebatan de ca dayo zanayîşo kronolojîk.

Xebate, qismê şîyayîşî ra teber hîrê qisman ra ameya raste. Qismê yewin de derheqê babetanê karî de şînasnayîş dayê, binê hîrê sernuştan de ca dayo etud kerdişo viraşteki. Qismê diyin de demî girewtê dest şînasnayîş dayê, badê cû antişê karan bi halê tabloyan de dayê. Bê nînan mîyanê cumleyan de nimûneyê şuxulnayîşî dayê. Qismê hîrêyin de derheqê raweye de şînasnayîşî dayê û nimûneyê karî dayê.

Qismê netîce de ca dayo daneyê ke resayî ci, pêşnîyazî rêz bîyê.

Çekuyî Mifte: Kar, viraşte, raweya xebere, raweya şertî

ÖZET

Bu çalışmada Zazacada fiillerin yapısal olarak incelenmesi ile zamanlarda ve kiplerde çekime girdikleri zaman uğradıkları değişimin araştırılması amaçlanmaktadır. Öncelikle fiil ile ilgili bilgi verilmiş olup ardından fiil konusunun ayrılmaz parçası olan mastar eki hakkında açıklamalara yer verilmiştir.

Çalışmada konuşma dilinde yaygın bir şekilde kullanılan fiiller tercih edilmiştir. Zazacada fiiller yapı bakımından; basit, bileşik ve türemiş olmak üzere üç bölümde incelenmiştir. Fiillerin zamanlara göre çekimi ile ilgili kısımda ise haber ve dilek kiplerinde fiiller üzerinde durulmuştur. Çalışmamızda; fiillerde çatı alanı ile ilgili oldukları için geçişli-geçişsiz ve etken-edilgen durumları üzerinde durulmamıştır. Giriş kısmında dilin önemi, dilin nasıl ortaya çıktığı ile ilgili görüşler, toplumsal yaşamda dil konularına değinilmiş ve Zazaca üzerine yapılan çalışmalara yer verilmiştir. Bu çalışmalar hakkında kronolojik bilgi verilmiştir.

Çalışma giriş kısmı dışında üç bölümden meydana gelmektedir. Birinci bölümde fiil ve ilgili konularla ilgili tanımlar verilip üç başlık altında yapısal incelemeye yer verilmiştir. İkinci bölümde zamanlar ele alınıp tanımlar yapıldıktan sonra fiil çekimleri tablolar halinde verilmiştir. Yanı sıra cümle içinde kullanım örnekleri verilmiştir. Üçüncü kısımda ise kip hakkında tanım verilip fiil örnekleri verilmiştir.

Sonuç kısmında ise ulaşılan verilere yer verilip öneriler sıralanmıştır.

Anahtar Kelimeler: Fiil, yapı, haber kipi, dilek kipi

ABSTRACT

In the study it is purposed to research the verbs structurally and the transition that they have been when they go conjugation in tenses and moods in Zazaki. First of all information about verb has been given and then explanations about infinitive which is an integral part of the subject of verb have been placed.

In the study, the verbs which are used widely in spoken language are preferred. In Zazaki, verbs are structurally analysed in three sections as simple, derivative and compound. In the part that is related to conjugation in tenses, it is emphasized on verbs in subjunctive and indicative mood. In our study, it is not emphasized on the situation of transitive/intransitive and active/passive since they are related to verbs voices. In the part of introduction, it is referred to the importance of language, views about how language has come up and language subjects in social life and studies which have been done in Zazaki are included. Chronological informations about these studies were given.

Except for introduction part the study consists of three parts. In the first part verb and definitions about related subjects are given and under three titles structural examinations are placed. In the second part tenses are handled and definitions have been done and then conjugations have been given with charts. Besides using examples have been given in sentences. Then in the third part definitions about mood have been given and verb examples have been given. As a conclusion, data which have been reached, have been given and offers have been lined.

Keywords: Verb, structure, the operative mood, the subjunctive mood

VATEYO VERÊN

Serranê peyênan de serê Zazakî de zaf cigêrayîş bîyî û zaf berhemî çap bîyî labelê nêzdîya heta serranê peyênan cîgerayoxan serê aye de nêvindetê. Çunke şaxo ke serî de vindertîş hewce nêker de yo. Aye ra xurtkerdişêko bîyaye nêmoto ra. Helbet zaf sebebê ney estî. Na xebate de aver berdîşe Zazakî û cayo ke Zazakî tede yena qiseykerdiş ra ber ma hetê gramerî ra Zazakî gênî xo dest.

Serê gramerê Zazakî de zafane cigêrayoxan berhem dayê, cigêrayîş kerdo. Çew hetê gramerî ra biewno nê xebatan, vînenno ke serê tayê babetan de xebat nêbîya.

Gramer şaxo ke alzinayî yê ziwanêk o. Merdim bifikirîyo yew herf tena yew çeku erzena yewna form. Tîya ra zorîya şaxê gramerî weş fehmeda. Yew ziwano nuşteki yo ortax bibo hem cigêrayoxan rê, hem zî wendoxan rê rehetî beno.

Gramer şaxêko hîra yo. No het de cigêrayîşê ke bîyî zaf tayê. Aye ra na xebat virazîyaya. Heto bîn ra serê karan de zaf xebatî bîyî labelê bi taybetî serê karan de hetê manayê viraşte de xebatên hîra tayê. Semedo ke ma hîna zanayîşên xorî bide, xebate de sînorkerdiş kerd.

Xebate de bi sey babet tena karî girewtê dest. Babeta karan zaf hîra û şaxo derg ê gramerî yo. Her hîrê qismê xebata ma de pênasayên kilm dayê û serê nîmuneyan de vindertî.

Qismê peyên de erjîyayîşê tezî virazîyayo. Badê cû qismê çimeyan de çimeyê ke înan ra feyde dîyo ame dayîş.

Na xebate de înan ke wextê xo yo erjaye verdayo mamostayê min o şewirmend Doç. Dr. Mustafa KIRKIZ'î rê, ey ke ardimên xo ma rê kêma nêkerdê her roj destekî xo teqdîm kerdê Nihat ÇAĞLAYAN'î rê û aye ke destekî xo kêma nêkerdê her tim moral dayo ma embaza min a delal Özlem KILIÇ'e rê semedê ardiman û tewrbîyayîşê înan zaf sipas kena.

LÎSTEYA TABLOYÎ

Tablo 1. Nimûneyê karo sade	20
Tablo 2. Karê pêrabesteyî ke formê name+kar de virazîyênî	24
Tablo 3. Karê pêrabesteyî ke formê sifet+kar de virazîyênî	27
Tablo 4. Bi karê ardimkerdoxî "ameyene" ra karê pêrabesteyî ke virazîyênî	30
Tablo 5. Bi karê ardimkerdoxî "dayene" ra karê pêrabesteyî ke virazîyênî	32
Tablo 6. Bi karê ardimkerdoxî "şayene/eşkayene" ra karê pêrabesteyî ke virazîyênî	33
Tablo 7. Bi karê ardimkerdoxî "biyene" ra karê pêrabesteyî ke virazîyênî	34
Tablo 8. Karo ardimkerdoxanê ke karanê pêrabestayenê ke sey sifet+kar û name+kar ameyê ronayene reyde ameyê tehet û bi no tewir virazîyênî	35
Tablo 9. Karanê pêrabesteyî ke bi manaye besyayî / manadaro îdyomin ra virazîyênî	38
Tablo 10. Karanê pêrabesteyî ke akîs ra virazîyênî	40
Tablo 11. Bi prefîksê a- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	43
Tablo 12. Bi prefîksê ci- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	43
Tablo 13. Bi prefîksê de- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	44
Tablo 14. Bi prefîksê pa- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	44
Tablo 15. Bi prefîksê pê- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	45
Tablo 16. Bi prefîksê po- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	45
Tablo 17. Bi prefîksê ra- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	46
Tablo 18. Bi prefîksê ro- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	46
Tablo 19. Bi prefîksê ta- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	47
Tablo 20. Bi prefîksê tê- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	47
Tablo 21. Bi prefîksê we- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	47
Tablo 22. Bi prefîksê cira- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	49
Tablo 23. Bi prefîksê cêra- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	49
Tablo 24. Bi prefîksê pêra- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	49
Tablo 25. Bi prefîksê pêro- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	49
Tablo 26. Bi prefîksê pira- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	50
Tablo 27. Bi prefîksê piro- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	50
Tablo 28. Bi prefîksê têra- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	50
Tablo 29. Bi prefîksê têro- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	51
Tablo 30. Bi prefîksê tira- rê karê viraşteyî ke virazîyênî	51
Tablo 31. Demo nikayîn/hîra de antişe karê bestene	57
Tablo 32. Demo nikayîn/hîra de antişe karê riştene	58
Tablo 33. Demo nikayîn/hîra de antişê karê pers kerdene	59
Tablo 34. Demo nikayîn/hîra de antişê karê sond dayene	59
Tablo 35. Demo nikayîn/hîra de antişê karê rast kerdene	61
Tablo 36. Demo nikayîn/hîra de antişê karê xirab bîyene	61
Tablo 37. Demo nikayîn/hîra de antişê karê hurdî kerdene	62
Tablo 38. Demo nikayîn/hîra de antişê karê ameyene vatene	63
Tablo 39. Demo nikayîn/hîra de antişê karê dayene şelênayene	63

Tablo 40. Demo nikayîn/hîra de antişê karê eşkayene werdene.....	64
Tablo 41. Demo nikayîn/hîra de antişê karê dayene şane kerdene.....	64
Tablo 42. Demo nikayîn/hîra de antişê karê qom vetene.....	66
Tablo 43. Demo nikayîn/hîra de antişê karê dest veng ameyene.....	67
Tablo 44. Demo nikayîn/hîra de antişê karê qîjî vetene	68
Tablo 45. Demo nikayîn/hîra de antişê karê çilk kerdene	68
Tablo 46. Demo nikayîn/hîra de antişê karê akerdene.....	69
Tablo 47. Demo nikayîn/hîra de antişê karê ramojnayene	70
Tablo 48. Demo nikayîn/hîra de antişê karê panayene	70
Tablo 49. Demo nikayîn/hîra de antişê karê cêra kerdene.....	71
Tablo 50. Demo nikayîn/hîra de antişê karê pêrodayene.....	71
Tablo 51. Demo ameyox de antişê karê nimitene.....	73
Tablo 52. Demo ameyox de antişê karê lengayene.....	73
Tablo 53. Demo ameyox de antişê karê mare birnayene	74
Tablo 54. Demo ameyox de antişê karê daxme kerdene	75
Tablo 55. Demo ameyox de antişê karê weş bîyene.....	76
Tablo 56. Demo ameyox de antişê karê pak kerdene	76
Tablo 57. Demo ameyox de antişê karê ameyene çînitene.....	77
Tablo 58. Demo ameyox de antişê karê ameyene viraştene	78
Tablo 59. Demo ameyox de antişê karê dayene kerdene.....	79
Tablo 60. Demo ameyox de antişê karê dayene wendene	79
Tablo 61. Demo ameyox de antişê karê eşkayene kerdene	80
Tablo 62. Demo ameyox de antişê karê ameyene qot kerdene.....	81
Tablo 63. Demo ameyox de antişê karê dest pêkerdene.....	82
Tablo 64. Demo ameyox de antişê karê piç piç kerdene	83
Tablo 65. Demo ameyox de antişê karê aguznayene.....	84
Tablo 66. Demo ameyox de antişê karê pakerdene	85
Tablo 67. Demo ameyox de antişê karê piragirotene	86
Tablo 68. Demo ameyox de antişê karê têrapiştene	86
Tablo 69. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê nimitene	88
Tablo 70. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê vejîyayene.....	89
Tablo 71. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê ray dayene.....	90
Tablo 72. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê bawer kerdene.....	90
Tablo 73. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê rast kerdene.....	91
Tablo 74. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê xirab bîyene	91
Tablo 75. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê ameyene vatene	92
Tablo 76. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê dayene sawitene.....	93
Tablo 77. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê dayene pine kerdene	94
Tablo 78. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê dest kewtene	95
Tablo 79. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê gix kerdene	96
Tablo 80. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê têdayene.....	97
Tablo 81. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê weçînetene	97
Tablo 82. Demo vîyarteyo dîyar de antişê karê piraşanayene	98

Tablo 83. Demo vîarteyo dîyar de antişê karê cêrabetene	99
Tablo 84. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê karê kiştene	100
Tablo 85. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê karê reqesîyene	101
Tablo 86. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê kare tehn dayene	102
Tablo 87. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê kare dûr kewtene	102
Tablo 88. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê kare ameyene vatene	103
Tablo 89. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê kare dayene sawitene	104
Tablo 90. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê kare dayene pîne kerdene	105
Tablo 91. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê kare dest kewtene	106
Tablo 92. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê kare gix kerdene	107
Tablo 93. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê kare tadayene	108
Tablo 94. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê kare weçînîtene	108
Tablo 95. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê kare piraşanayene	109
Tablo 96. Demo vîarteyo nêdîyar de antişê kare cêrabetene	110
Tablo 97. Antişê Demo Vîarteyo Nikayin/Hîra dê Karan	113
Tablo 98. Antişê Demo Vîarteyo Nîyetin ê Karan	115
Tablo 99. Antişê demo vîarteyo nedîyar o veren ê karan	117
Tablo 100. Antişê raweya waştîşî yê karan	121
Tablo 101. Antişê hîkayeya raweya waştîşî yê karan	123
Tablo 102. Antişê raweya ganîyîye yê karan	125
Tablo 103. Antişê hîkayeya raweya ganîyîye yê karan	127
Tablo 104. Antişê raweya şertî yê karan	130
Tablo 105. Antişê hîkayeya raweya şertî yê karan	132
Tablo 106. Antişê raweya fermanî yê karan	134

KILMNUŞTEYÎ

c.	: cild
ç.	: çape
çar.	: çarnayox
ed.	: editor
e.e.	: eynî eser
fem.	: feminine gender
Eğitîm-Sen	: Eğitim ve Bilim Emekçileri Sendikası
KİTS	: Kütüphanelerarası İşbirliği Takip Sistemi
masc.	: masculine gender
o.	: omari
o. a. b.	: o ay bîn
r.	: rîpel
s.b.	: sey bînon
t.ç.	: tarîx çînîyo
t.	: termîn
TDK	: Türk Dil Kurumu
ûsb.	: û sey bînon
yh.	: yewhumar
zh.	: zafhumar

DESTPÊK

Bi vateyê klasîkî ra ziwan, fikir û hîsan rastîye ra yan zî rayîrêko bîn ra o ke wezîfeyê resnayîş vînenî yew wasita yo û semedê fehmkerdişê wasitaya resnayîşî yew xurtbîyaye yo. Ziwan tena yew wasitaya resnayîş ra ber zaf mana îfade keno. Ziwan eynî wext de; dîyardeyo ke tarîxkî û komelkî û zanistkî yo. Merhaleyêke komelî vîyarnayêne, averberdiş û xurtbîyayişên zanistkî û teknîkî bi wasitaya ziwani resêne azo peyênan. "Ziwan yew şarî yan yew komelî ano yew ca, hetê hedefanê ortaxan şaweno û sey sosyalî newe ra berhem ano yew mîraso kulturî û yew çimeyê zengînîya tarîhkî ya. Heto bîn ra zereyê demêko derg de form beno dezgehêko sosyal o."¹

Ziwan, çew eşkeno mîraso ke sînorê ey çino bivîno çunke ferd hîs û povetanê xo hema hema bê sînor îfade keno, wasitayêko hîsan resneno. Heto bîn ra ziwan wina sîstemêko rojger û kaînat dano fehmkediş. Çike kewt dest vebînî û dane bi wasitaya ziwani resneno. No het ra ziwan dîyardeyêko hem şexsî hem zî komelkî yo. Taybetîya ey, ey kena wasitaya neqilî.

Çiyê ke ciwîyayê, şerî, nêweşiyî, afetî, aşitîyî, destanî, efsaneyî û resnayîşe bawerîyan de rolo gird yê ziwani yo. Bi kilmekî wasitayêka fehmdayîş û resnayîşo nêqedêyeno û kê m nêbeno. Xurtbîyayiş, averberdiş vilabîyayişê kulturî de rolê ziwani çew nêşkeno înkâr biko. Ziwan, mîras û zengînîya rîyê erdî ya.

Kombîyayişê ney vateyanê ma xo no îzahatî de vînenî: "Ziwan pênasanê; aîdîtî, şexsîtî, refleksê netewe, komelnasî, karakterê bixî, hîs, şekil girewtîşê ruhî, fikirbîyayişo nême, estbîyayişê kulturî, îdraqkerdiş, hukm, serwextbîyayiş û nêzdîbîyayişî û sb. deqasê bibîyayiş û çinbîyayişan muhîm o."² Hetê komelnasî ra zî ziwan zaf muhîm o. Demê komelkîyan û rolê hemsencîya hêzî zî mera vînd nêbo. "Ziwan eynî wext de berhermardişê vilabîyayişê hêz yê komelkî de, ramîyayiş de û newe ra şekil girewtîşî de tewr wasitaya girîng a. Mîyanê komelî de cayê merdîman

¹ Eğitim-Sen, *Anadilinin önemi: Anadilinde Eğitim*, ç. 2, Eğitim-Sen Yayınları, Ankara, 2012., r. 8.

² Serkan Oğur, *Farsça-Zazaca-Kurmanca Mukayeseli Gramer ve Temel Sözlük*, Yazılama Yayınevi, İstanbul, 2014, r. VII.

belî keno. Viraştişê yê cayî de rol gêno. Mana bi wasitaya ziwani resena, eynî wext de îdeolojîyê komelî mojneno ra."³

Ziwan, tewerabedilîyayiş û agêrayişî de hêmanên tamamkerdox o. Fehmkerdiş, zanayiş û etudkerdiş ziwani, fehmkerdişê xoza û hîşa merdimî yan zî tevgerên komelkî û averberdişê nuqtaya teknolojîk û zanistkî de manadayişê ma, erjîyakerdişê ma senî yew kar keno ser? Tîya persa ke çew biperso na ya: ziwani çi yo û ma ziwani ra çi wazenî? Tîya felsefeya ziwani kewena dewre çunke ziwani tena ziwannasî yan gramerî nêyo eynî wext de dîyardeyeko ke felsefe, psîkolojî û mantike etudkeno. Resnayiş de çî ke hiş de beno ziwani şuxulyeno, merhaleyêke hişî de bena fikir virazena. Resnayişo ke bi ziwani beno edet, tore, kultur, hîs û fikir virazeno û çîyo ke resnayo fikir o. Tîya têkilîya ziwani û fikirî zî vejîyena orta.

Ziwani zî fikir zî koma prosesên têmîyankerde ya. Ney her di hêman bê kîştî sosyolojîk ra ber kîştî bîyolojîkî ya merdimî eleqedar kenî. Labelê demo peyên de ziwannasî de şaxê newe û têngînên newe vejîyayê orta. Ziwannasîya caardişî, ziwannasîya klînîkî, ziwannasîya genetîkî yê ke ney şaxê binî ra vejîyayê ver. Fikir eke bi rayîrê ziwani resîyeno, ziwani çayê fikirî de yo, hişê prosesî kamcîn de ca gêno? "Ziwani, rewşe û objeyên cûya rast de, bê hûmaran dîyarîyê û têkilîyê ke ney obje û rewşan, şekle fikirê merdimî de hûmarîyenê û nîşanê fikirî ramojneno sey wasitaya maddî fonksîyon vînenê. Têngînê hişê merdimî de vengî yenî yew ca yanî wasitaya qîsa ra nimiyenî. Qîsê ke vengani ra virazîyena têngînîyê kî yew obje û rewşê ke dîyarî ra şekle ko madî yê hişê merdimi ya."⁴

Qiseykerdiş û ziwani, ziwani nûstekî key, senî virazîyayo û senî vejîyayo orta babeta ke girîng yê bîn ê. Ziwannasîya tarîxî bi ney eleqedara. Tîya babetêke girîng zî esta. Xebatî ke derheqê ziwani de bawerîyan ra, pêhesîyan ra, eşnawitan ra çew durî vinder o û nêzdîya zanistî bibo. Çunke teorîyê ke eleqedarê babete zîyade yê û yewbînan nêgênî. Bîyayişê ziwani de di hebî persî estî hewceyo ke çew nînan yewbînan ra cîya kero. Serî de ziwani senî vejîyayo orta, merdimî çi wext destpêkerdo qiseykerdiş û çira destpê qiseykerdişî kerdo yanî senî, çira û peynîya

³ Özgül Çelikkaleli, "Dil Neden Bir Feminist Sorunudur", Kadın: Eğitim Sen Kadın Bülteni, t. 9, o. 1, t. ç., r. 56.

⁴ Kaken Ahanov, *Dil Biliminin Esasları*, TDK Yayınları, Ankara, 2008, r. 53.

çiyî de hewceyîya ney dîya. O diyin ziwani senî virazîyayê. Ma bi persê ney her di persî senî yewbînan ra cîya benî, perso ewil heta şîyîşê merdimê verên, perso diyin yeno bade demo ke ziwani vejîyayê orta. Bîyayîşê ziwani persêko tena ziwannasîya tarîxî cewab keno nêyo. Tîya felsefe, arkeoloji, etnografya, fîzyolojî, merdimnasî û sey şaxê prehîstoriya-protohîstoriya de destek muhîma.

Akîs bi eleqeya teorîyê bîyayîşê ziwani ra yew o û zafî hetgirî kom kerde. Goreyê ney teorîyî merdim vengane xozaye, vengane heywanan bêzarî kerde û vengê ewil vetê. Badê cû bi deman vengî bî vate û name dayo objeyan. Pawitox verenî yê teorîyê akîs filozofên Grekî yê. Seserranê 18. û 19 an de zafî hetgirî bî. Yew zî filozofê Alman G. W. Leibnitz tewr ver de bî.

Fikirê Îslamî de derheqê çimeyê ziwani de teorîyî erzîyayê orta û munaqese bîyî. Ney teorîyî yew nuqta de ameyê yew ca: ziwani hetê Homayî ra dîyayo merdimi. Dinyaya Îslamî ra yê ke derheqê çimeyê ziwani de fikir û dîyayîşê xo vato, înan ra Ebû'l-Hesen el-Eşarî, Ebu Heşîm el-Cubbaî, Ebu Îshaq el-Îsferayînî, Ebu Bekr el-Bakillanî, Cuveynî û Gazalî yo. Îbn Hezmî dîyayîşê xo yew game berdo ver û ziwano ke cenet û cehennem de qiseybeno derheqê ey de fikirê xo vato.

Ziwani senî û key vejîyayo orta, teorîyê ke ziwani senî xurtbîyo, nêzdîbîyayîşê spekulatîf, teorîyê navdar timûtim bîyî. Nînan ra yew zî "ziwani bi mîmîkan destpêkerdo, badê cû vengî bî ser peynî de erzenî orta vanî ziwani vejîyayo."⁵

Derheqê vejîyayîşê orta yê ziwani de mîtî zî estî. Tewr verên Efsaneyî Babîlî ya. Bi goreyê ney merdim gêreno bireso Homayî û semedê xo nêzdîya ey bi mojnayo ra yew birc virazeno. Zafî demî nêvîyarenî birc beno berz. Senî Homa ney vînenî hêrs beno, yeno rî erdî yew ziwani dano yew merdimî. Wina merdimî hinî yewbînan fehm nêkenî û awanîya bircî vindeno. Tîya de yeno fehmkerdiş ke ziwani qey merdimî yewbînan fehm bikî nê, sey ceza dayo merdiman.

Roja ma de dinya de çiqas ziwani esto kes tam nêzano. Hema tayê ziwani estê nêbî ziwano nuşteki, tayî ziwani estî hema etud nêbî, cîya cîya mintiqayanê dinya de bi taybetî Afrîka û Amerîkaya Latînî de tay qebîle estî hema tespît nêbî. Serra 1980

⁵ Merritt Ruhlen, *Dilin Kökeni: Ana Dilin Evriminin İzinde*, Hece Yayınları, Ankara, 2006, r. 9.

ra pey 6000 û 7000 ziwan hûmarîyayo. Labelê texmînî beyntarê 2000 û 10000 de vajîyena. Sebebê ney heta peynîya seserra 20. de xebatê ke bî zaf tayê daneyên zanistkî û cigêrayiş bîy. Pêroyî bi muşahede hûmarîyayo. "Xebata tewr gird ya roja ma Ethnologue serra 1974 de çim ra vîyarna û dinya de 5687 hebî ziwan qebulbiyî. Serra 1977 de xebata ke Voegelinan kerda nêzdîya 4500 hebî ziwani tede vîyartê. Çapê Ethnologue ye hîrêsin de 6703 ziwan bîyî. Ferhengê Atlasa Ziwanên Dinya de 6796 ziwani lîste bî."⁶

Bê qasê ziwani senî vejîyayê orta ra teber babeta tewr girde ke zaf hetgiran nêvîneya zî esta: Merdişê ziwanan. Ez nika ney satiran nusena, bizani cayêkê dinya de ziwane mirenî. Yew ziwan çira mirenî? Çew tam nêzani, zaf cayanê dinya de ziwani mirenî. Merdim, mergê yew merdimî rê dejenî. Labelê merdişê yew ziwani merdimîxemgîn keno çunke yew ziwan bimiroy, tena yew ziwan nêmirîno, yew kultur, bawerî, rîtuellanê dîni, edet, tore, cûya rojane, şeklî fikirî, awaniya komelî mirenî. Eke no ziwan, ziwaneko qeyd nêbiyayo, vîndbiyaye hîna ziyade yo, no ziwan têpiya nêyeno, yew komel, yew cuye hinî çina, merda.

Merdişê ziwani trajîko, bihîso û dejo çunke semedê yê ke o ziwan qiseykenî inan rê yew vîyarte qediyayo û tenayî destpêkerdo. Çunke ziwan newe nêbeno yan zî ziwan pil-purt nêyo çew newe ra bigêro û biyaro herinda ronayo. Ziwani, tarîxê merdimayî de zaf merdî labelê dinyaya ewroyin de vîndbiyaye hîna ziyade yo. Ma semedê ziwanan zifqêra teng û xeter de yê. Tewir bi tewir sebebî estî. Averbardişê teknoloji lez raver şino û sere çarneno. Kûrewî biyayişî sînorî wedartê. Kulturî ginayî yewbînan re. Ney semedê xurtbiyayiş çiyê holî ye labelê semedê ziwanan û kulturên cayîkan rê xeter o. Bandor kerdişê teknolojiyê serê şaxê cuye, ziyadebiyayişê bajarî, barkerdişo dewan ra bajar û peynîya ney barkerdişî bajar de tenayî zîyade bîya. Teriknayişê ziwane dayike, polîtîkayê dewlete yê yew ziwani, asîmilasyonê kulturî, sey şarê rojawanî pot û cilan xoradayiş, zîyadebiyayişê xurtbiyayişê resnayiş û resayiş ziwan zaf negatîf kerdo.

Kulturo cayî, mîyanê kulturo serdest de asîmile beno. Şertê komelkî, sîyasî û ekonomîk zî lezdanî na rewş û sere de teda virazenî. Semedê mîyanê komelî de xo

⁶ David Crystal, *Dillerin Katli*, Profil, ç. 2, İstanbul, 2010, r. 16.

qebulkerdiş de şexs, hetê ziwane desthîlatdarî anceno. Na nuqta de di ziwani estê. Hem hetê komelî ra qebl vînayîş û hem zî ziwano desthîlatdarî û ziwane dayike. Yewbînan ginayîş senî beno zîyade wina di ziwani orta ra wedarîyenê. Ziwane dayike hinî hedî-hedî nimiyeno. Ciwanan na rewş ra zaf bandure benî. Hewceyanê xo bi ziwano diyin vînenî. Ziwano verên hinî bêhewce yo. Qisey kerdiş beno eyb. Mîyanê keye de çew şermayeno qisey biko. Ziwano ke nimiyayo hinî tepîya şîno. Ziwano ke nêşuxulîyo mergî ra bêno nêzdî.

Na rewş ziwani ke merdî yê, xeter de yê, goşeyo dinyayo bîn de yî semedî înan zî vîyareno. Sebebê kurewî nêbedilîyenî. Rojêk dinya de tena ziwane Îngilîzkî maneno. Eke na rewş bîbo a roje peynîya dinya yo.

Û vîndbîyayîş kamca de lez de yo çew nêzane. Ziwannasîyo caardişdar hema tam nêronişto û tengasîyê ke cigêrayoxanê warî dîye, tengasîyê çimeyî, fon nêdîyayîş, daneye zelalî nêkewtê orta. UNESCO 21'ê sibate 2002 de Atlasa Ziwane Dinya weşana û tede va ziwane dinya ra nêmeyê înan hayê benî vînd. Kamcîn ziwane xeter de yo. Kamcîn ziwane çiqas binê xeter de yo. Derheqê ney de tay cigêrayoxan tayê sinifkerdişê eştê orta. "Ziwani xeter de yî, bawerî yan zî merde yî. Michael Krauss ney rê yew têgînêko hîra keno ser: ziwano ke hetê tutan ra sey ziwane dayike nêno musnayîş, o ziwane sekrat de yo. No têgîn 'tena' duştê xeterî rê zaf wet yew ziwane şîyo, ey weş îfade keno. Çünke resnayîşê ziwani beyntarê nesîlan de vindeto. Ma eşkenî vaje ke maneno gandarê ke tewirê înan nêzêdîyenê."⁷

Na nuqta de girîngîya ziwane dayike vejîyena orta. Ziwane dayike yê tutî dadîya ey ra, keyeyê ey ra û derûdorê ey ra ziwano ke musa yo. Ziwane dayike yê tutî ey û daya ey rê temasê xo, nêzdîbîyayîşê xo, resnayîşê xo tewr duştê serên de semedê pêkerdişî îmkane dano. Xo îfade kerdişê ferdî, hîsanê xo, resnayîşê fikiranê xo ziwane dayike de vindete nêyo, herîkoko. Xurtbîyayîşê psîkolojîk yê tutan de rolêko girîng kay keno. Dewrê perwerdeyî yê tutî semedê hunerê musnayîş, qeymkerdişê fehmkardiş-têgînîkerdişî û îfadeyê ey hîna asane o. Ziwano bandure de tut çî zano labelê nêzane xo îfade bikero, wina perwerdeyî ra tepîya maneno. Tîya girîngîya ziwane dayike û diziwani vejîyena orta. Diziwani xurtbîyayîşê vîrkî û ziwankî rê

⁷E.e., r. 35-35.

pozîtfî keno ser. Heto bîn ra tutê ke ziwane pîrikanê xo qisey nêkenê bi dadî û babîyê xo rê resnayış nêkenî de hîsê aydıyet û nasnameyî zî orta ra wedarîyeno û komelê xo rê, kulturê xo rê sey ferdê ke xerîb benî pîl.

Ziwanê dayike sey heqê binge yê merdimî erjîyeno. Zaf peymanê û kontratê mîyanneteweyî de ganî heqo pawite yê binge yo.

Weşana ke UNESCO Atlasa Ziwanê ke xeter de yê de welatê ma ra 18 hebî ziwani estî. Babeta tezê ma Zazakî zî na Atlas de ca girewto. Rewşa Zazakî sey 'vulnerable' (xo nêpaweno) ramojna yo. No duşt 'Kategorîyê Ziwanê ke pê Bawerî Nêbena' yo û tutê ke qisey bikî estê labelê tena keyeyan de yeno qiseykerdiş û duştî sînordar de mendo.

Xebatê ke derheqê Zazakî de bîyî heta peynîya seserra 19. şinî. Serra 1857 de Peter J. A. Lerch berhema xo ya Forschungen Über Die Kurden Die Iranischen Nordchaldäer de xebatê xo ardê pêser. Xebat, Zazakî de zafî arêkerde mîyanê xo de hewe keno. Serra 1862de Wihelm Trecker û Otto Blau notê xo weşaneyê. Nê notî Zazakîya Dêrsimî sero de biyî. Serra 1865 de Friedrich Müller xebata xo ya Beiträge zur Kenntniss der neupersischen Dialekte: "Zaza Dialekt der Kurden" de weşaneno. Ewro na xebate Kitabxaneyê Eyaleta Bavyera de ya û 21 rîpelîya.

Berlin de serra 1903 de zî Albert von Le Coq xebata xo ya "Kurdische Texte" nuseno. No text bi herfanê erebî amade bîyo. Demo ke ameyî serra 1913 Londra de Ely Banister Soane xebata xo ya "Grammar of the Kurmanji or Kurdish Language" nuşt. Senî ameyî Serra 1932 de xebatêya Oskar Mann û Karl Haddank "Die Mundarten der Zaza" vejîya. Na xebate beyntarê serranê 1867-1917 mîyanê xo de hewe keno û kitabo çarin yê reze "Kurdish-Persische Forschungen" yo."⁸

Celadet Bedirxanî serra 1933 tayê Zazakî arêkerde kerdê û ney kovara Hawar de weşanîyayê. Serra 1985de Terry Lynn Todd teza xo yê doktora bi nameye "A Grammar of Dimili: Also Known as Zaza" Michigan de weşana. No tez manaya modern de çew eşkeno vajo ke kitabê gramerî yo hîra û verên o. Serra 1993 de C.M. Jacobson, Bonn de xebata xo ya bi nameye "Rasnustena Zone Ma/Handbooch für die

⁸ Karl Hadank, *Zazalar ve Zaza Dili*, (Çar. Erol Sever), Zaza Kültürü Yayınları, Ankara, 1994, r. 5.

Rechtschreibung der Zaza-Sprache" nuşt. Serra 1994 de M. Sandonato xebata xo ya bi nameyê "Zazaki:Typological Studies Innegation" Amsterdam de nuşt. Serra 1996 de Gippert Jost Unîversîteya Frankfurtî de xebata xo ya bi nameye "Zazaca'nın Tarihsel Gelişimi"⁹ nuşt. Serra 1998 de Ludwig Paul xebata xo ya bi nameyê "Zazaki-Versuch einer Dialektologie" nuşt. Serra 2006 de Ernst Kausen xebata xo ya bi nameye "Zaza" nuşt.

Teberê welatî de bitaybetî hetê cigêrayoxanê Almananî ra xebatê ke bî ney ê. Peynîya serra 1980an de tewir tewir welatanê Ewropa de tayê kovare û rojnameyan de tekstê Zazakî vejîyêne. Serra 1996 de Îsveç de weşanîyîşê xebatê ke semedê ziwani bîyî babeta vetîşê kovarêke de bire girewt û bi nameyê "Vate" ra vejîya. Şarî, na kome sey Gruba Xebate ya Vateyî şinasna. Koma Xebate ya Vateyî warê edebîyatî de zaf berhemî Zazakî rê dayê qezenkerdiş. Hikaye, roman û kitabe gramêrî têdima vejîyayê.

Serranê 2000an de Tirkîya de hem warê gramerî de û hem zî sey edebî kitabî vejîyayê. Serra 2001de "Giramerê Zazakî" yê Fahri Pamukçuyî, serra 2003de "Türkçe Açıklamalı Kırmancca (Zazaca)" yê Munzur Çemî, serra 2005de bi nameyê "Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî)" yê Gruba Xebate ya Vateyî, serra 2006de bi nameyê "Türkçe Açıklamalı Kürtçe/Kırmancca/Zazaca Dil Dersleri" yê Deniz Gunduzî, serra 2012de bi nameye "Dersê Ziwani" yê Roşan Lezgînî weşanîya. Bi ney rê nêmend vejîyayîşê berheman dewam kerd. Ma ameyî serra 2012 de bi nameyê "Dersên Zuwenî Kurdî-Zazakî û Sonikî" hetê Turan Erdem û Orhan Erdemî ra weşanîya. Serra 2013 de bi nameyê "Ebe Vatena Tırki Kitabê Musena Zazaki: Türkçe Açıklamalı Zazaca Öğrenme Kitabı" yê Haydar Şahînî vejîya. Serra 2014 de di berhemî bi nameyê "Farsça-Zazaca-Kurmancca Mukayeseli Gramer ve Temel Sözlük û Zazaki/Kırmancki Destûr (Gramer) be Qisey Kerdene" yê Serkan Ogurî weşanîyayê.

⁹ Jost Gippert, "Die Historische Entwicklung Der Zaza-Sprache", <http://titus.fkidg1.uni-frankfurt.de/personal/jg/pdf/jg1996f.pdf>. Electronical Publication, 2008.

No warî de tena kitabê gramerî nê ferhengî zî têdima vejîyayî. Serra 1997 de Mesut Özcanî "Zazaca-Türkçe Sözlük"¹⁰ amade kerdo, serra 2001 de Harun Turgutî "Zazaca-Türkçe Sözlük"¹¹ amade kerdo, ancî serra 2001 de hetê Grûba Xebate ya Vateyî ra berhemî bi nameyê "Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî"¹², "Sözlük: Türkçe-Kirmanca (Zazaca)"¹³ û "Türkçe-Kirmanca (Zazaca)Sözlük: Kirmanca (Zazaca)-Türkçe Sözlük"¹⁴ amade bî, serra 2005 de hetê Roşan Lezgînî ra "Ferhengê İdyomanê Kurdî (Kirmanckî/Zazakî)"¹⁵ amade bî, serra 2006 de Turan Erdem û Orhan Erdemî amade kerdo bi nameyê "Zazakî-Tirkî: Tirkî-Zazakî Ferheng"¹⁶, serra 2011 de hetê İbrahim Bukanî ra "Zazaca-Türkçe Atasözleri ve Özlü Sözler"¹⁷ amade bî, serra 2013 de hetê Roşan Lezgînî ra "Türkçe-Kürtçe (Zazaca) Sözlük: Ferheng Kurdî (Zazakî)-Tirkî"¹⁸ amade bî û serra 2012 de hetê R. Hayig û B.Werner "Zazaca-Türkçe Sözlük, Türkçe-Zazaca Sözcük Listesi"¹⁹ ameyo amade kerdene.

Bê înan unîversîteyan de derheqê Zazakî de semedê cigêrayişî bernameyê lîsansê berzî abî, sempozyumî virazîyayî.

Serê Zazakî de çiqas cigêrayişî bîbê, serê Zazakî de çiqas xebate bîbê hendek dewlemendîya aye vejîyena meydan. Çi heyfo ke rindîya ziwani hema tam nêerzîyaya orta. Sey rindîya her ziwani rindîya Zazakî zî esta. Zivan de hema yewbîyayiş û standartbîyayiş tam nêqedîyayo. Weşanî zafane bi fekan amade benî, tîya têmîyankerde zîyade ya.

Ganî bingeyî zexm bierzî, ganî lingî zexm erd ra nayê çunke tutêk ziwane dayike yê xo pêro pîya û zivan de têmîyankerde çinbo, bimuso hîna o tut beno

¹⁰ Mesut Özcan, *Zazaca-Türkçe Sözlük*, Kaynak Yayınları, İstanbul, 1997.

¹¹ Harun Turgut, *Zazaca-Türkçe Sözlük*, (Ed. Cemal Taş), Tj Yayınları, İstanbul, 2001.

¹² Grûba Xebate ya Vateyî, *Ferhengê Kirmanckî (Zazaca)-Tirkî*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2001.

¹³ Grûba Xebate ya Vateyî, *Sözlük: Türkçe-Kirmanca (Zazaca)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2001.

¹⁴ Grûba Xebate ya Vateyî, *Türkçe-Kirmanca (Zazaca)Sözlük: Kirmanca (Zazaca)-Türkçe Sözlük*, (Ed. Abdullah Keskin), Avesta, İstanbul, 2001.

¹⁵ Roşan Lezgîn, *Ferhengê İdyomanê Kurdî (Kirmanckî/Zazakî)*, (Ed. Deniz Gündüz), Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005.

¹⁶ Turan Erdem o.a.b., *Zazakî-Tirkî Tirkî-Zazakî Ferheng*, Weşanen Arya, İstanbul, 2006.

¹⁷ İbrahim Bukan, *Zazaca-Türkçe Atasözleri ve Özlü Sözler: Qalê Vêrimu o Qalla Rêber*, Seresur Yayınevi, Ankara, 2011.

¹⁸ Roşan Lezgîn, *Kürtçe (Zazaca) Sözlük: Ferheng Kurdî (Zazakî)-Tirkî*, Weşanxaneyê Roşna, Diyarbakır, 2013.

¹⁹ Rosan Hayig o.a.b., *Zazaca-Türkçe Sözlük, Türkçe-Zazaca Sözcük Listesi*, Tj Yayıncılık, İstanbul, 2012.

serkewte. Eger o ziwanê dayike sey Zazakî xeter de yo, hîna zaf girîng o, o ziwan qeyd bibo û o ziwan binuso û bireso qıcanê ke newe yenî dinya.

Bitaybetî qaydeyê gramerî tam cayê xo de ronênişê, resnayış de manaya xo vînd bikî hîna beno çiyêko xirab. Xebata gramerî de ganî çew zaf bale bikêro. Çünke gramer viraştişê ziwanî û ruknê ziwanî etud keno. Ganî ney ruknî cayê xo de tam ronîşî.

Armancê Tezî

Babeta cigêrayişî "Zazakî de Derheqê Awanî û Antişî yê Kar ser yew Cigêrayiş"ê. Cigêrayişê ma çiqas bi xorî aseno ke Zazakî ziyade serê karan da ronîyaya yan zî hetê tevgerî ra virazîyayo. Zazakî de cayo ke girîng û rolêko gird yê karan esto. Kar tîya sey mifte yê. Amanca nê tezî viraştişê karan vetişê orta û sinifkerdişê karanê. Heto bîn ra xebate de karî deman û raweyan de demo ke yenê antiş de ca bedilyenî uca ma girewto. Bi nimûneyan karê ke virazîyenî, ma serê înan de vindetî.

Hîrayîya Tezî

Zazakîya ke nê rojan de yena qısey kerdene esas girewta û karê aye etud kerdê. Babet, viraştişê gramerî û beşê antişî yo. Aye ra ma karî tena hetê viraştişî ra girewtî. Viraştişê înan demo ke şî antiş bedilîyêne aye ra têdir dem û raweyan ma dayê. Karê transîtif- întansîtif, karê aktîf-passîfi-causative sîwana karan ê aye ra ma tira vetî. Derheqê deman de etudkerdişê ko hîra kerd. Bedilîyayişo ke karan dî amanca esas bi aye ra ma denêkewtî, ancax pêname dayê.

Metodê Tezî

Merheleya cigêrayişî de derheqê babete de ferheng, kovar, rojname û kitaban ame cigêrayiş. Înternet ra, binkeyê daneyî ra, keyepelê webî ra, e-bookan ra kar dî û kitabxaneyan de cigêrayiş virazîya. Nînan ra teber kuçe de, qıseykerdişê ke mîyanê şarî de viyarenî qeydbî û karî wina peyda bî. Zazakî de hema warê viraştişî de bi

babetî etudkerdiş nêbîyo. Pênaseyî tam nêvirazîyayê ey ra çimeyê ziwananê bînan ra û ferhenganê felsefeyan ra kar dî.

Zanayîşê ke kewtê ma dest, kerdê sinife. Teberê welatî de xebatî ke bî zafane çimeyê Almankî bî. Nê çimeyan ra tena çismêkî derûdorê înternetî de dî û tayê zî KİTS de peyda bî.

Cayo ke Zazakî tede yena qiseykerdiş, cigêrayoxê ke na mintiqa de cuyenî, yê ke na mintiqa şinasnenî, berhemê înan yê xebat gramerî û berhemê înan bingey ameye girewtene.

Qiseykerdoxê ke na mintiqa de cuyenî (ziwannasî de yê ke ziwane cayî qisey kenî sey 'qiseykerdox' name bî) qiseykerdişê înan yê rojane goşdarî kerd û not girewt. Nimûneyê karan qeyd kerdê. Ney nimûneyê arêbîyê ke cuya rojane de yê tewr zaf şuxulyenî xebate de şuxulnayê.

Karî hîna rehet û hîna akerde be, fikirayî û bi halê tabloyî de dayê. Tîya de tezê doktorî ke Aynur Bozkurt unîversîteya Sorbonne de amade kerdo, rayîro ke aye şuxulnayo etud kerdo. Cigêrayîşê bi sernameyî "Kesandina Lêkêrên Kurmancî"²⁰ tena şuxulnayîşê karan deman de û raweyan de bi rayîrê tabloyî dayo.

²⁰ Aynur Bozkurt, *Kesandina Lêkêrên Kurmancî*, Weşanên Dozê, İstanbul, 1999.

QISMO YEWIN

1.1. Pênaseyê Karî

Çekuya "karî" sey pêroyî ferhengan de yeno manaya kar, pîyagêrayiş, çalakî. Çekuyê ke dayîşzanayîşê yew bîyayîş, viraştîş, vindetiş danî kar ê. Nê pênaseyan de zî aseno semedê ma behsa karî bike dîmenê fizîkî yê çekuye de yew tevgerê aye, semedê tevger şîyayîşokî beno û ganî peynîya no şîyayîşî bido. Ma ney bi nimûneyan îzah bike:

1- Feriknayene – hurdî kerdişê nanî

Yê ke viraştîşê çekuye de ca gênî, vengê –f,-e,-r,-i,-k,-n,-a,-y,-e,-n,-e halê hemeyî de pîyagêrayîşê feriknayîşî danî. Semedê nê pîyagêrayîşî kewtî tevger û kar rokerdo çalakîye rê dano.

2- vajirîyayene –ame vatene

Ancî vengê kî awanîya çekuye de ca gênî, fikiro ke zîhîn de virazîyeno sey bi fekî bi reso, no yew pîyagêrayîş o. No pîyagêrayîş virazîyayo ma rê dano zanayîş.

Ma eşkenî nimûneyan zîyade bike. Ancax beşê antişê karan de dayîşfehmkardişo cayeko hîra gêno ey ra tîya ma no zanayîş kilmekî bide besa.

Hengirmen derheqê karan de wina vano; "Mîyanê tewiranê çekuyan de tewr girîng hêman çalakî yê. Çünke çalakî, pênaseyan ra zî fehmbeno ke karê ke gandan kerdê, bîyayîşê înan, tevgerê înan û rewşa ke yê tede yê bidê zanayîş, şexs, dem û têgînê hukmî dano."²¹

Oğur wina vano "kar sey bingê bi bedilîyayîş giredayê tevger o. Bedilîyayîş û tevgero ke mîyanê cumle de yeno meydan dano fehmkardiş. Karî cumle de çekuyê ke namekerdişê karo her tewr, her bîyayîş û her rewşe anî cayan ra vanî."²²

²¹ Mehmet Hengirmen, *Dilbilgisi ve Dilbilim Terimleri Sözlüğü*, Engin Yayınevi, Ankara, 1999, r. 169.

²² Oğur, *e. e.*, r. 83.

Demir, behsa yewna taybetîya karî keno û wina vano: "Çalakî, tewr taybetîya girîng ristim yan zî govdeyanê xo tewrê çekuyanê bînan ra cîya keno, girewtîşê qertafê –ene yo."²³

Pênaseyo ke yewna çime de dayo wina yo: "Çalakî, beyntarê çalakîyê gandarane de rîyê nêmedarîya înan ra qabîlîyetê giredaye yê înan tewirê qîsa yê zaf xurt bî."²⁴

Kar babeta gramerî yo û warê zanayîşê şekl yê gramerî de termêko etud bîyaye yo. Eynî wext de girîngîya ziwanî, yewîyêka çew aye ra xo têpîya nêgêno yê gramerî ya, çünke gramer de babeta ke gênî dest çî bena wa bibo hemeyan de kar cayê xo gêno. Kar çinbo hukmo ke qayilê cumle de bidî nêmaneno. Tîya ma eşkenî vaje wezîfeyo bînge yê karî bibo kardarê cumle. Çünke cumle de herinda çekuya bînge de yo û cumle de çî qewîmîyeno hemeyan mîyanê xo de heweneno.

Ma nimûne bide:

1- Şima rayîr de vindete bî.

"vindetene" karê na cumle yo. Rayîr de rewşa ke merdim tede beno û herinda ey dano zanayîş. Eg ma karî bîrze cumle wina manena; Şima rayîr de

Cumle de wazenî rewşa ke bivajîye û bivirazîye, kar çinbo kifş nêbena.

2- Reng, rîyê mi de nêmendî bi.

"mendene" karê cumle yo û halê antişî de ameyo antiş. Ma karî cumle ra veje, cumle wina manena; Reng, rîyê mi de

Tîya semedo ke hukmê tamam nêbîyo cumle bêmana menda.

Karî sey bê antişî zî manakirîşeno, ancax dayîşfehmkirdîş de sey bê antişî nêşuxulîyeno. Nimûne; karê "qehirîyayene", kar halê mesderî de tena serebûto û çalakîya qehirîyayene dano. Na çalakîye hetê kamî rê, senî û çira virazîya belî nêyo. Yanî yew îfadeyê mana çin o.

²³ Tufan Demir, *Türkçe Dilbilgisi*, ç. 2, Kurmay Yayınları, Ankara, t. ç., r. 333.

²⁴ Günay Karaağaç, *Dil Bilimi Terimleri Sözlüğü*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 2013, r. 389.

Karî bi serê xo tena nêyenî şuxulnayiş. Semedê bîyenê şuxulnayiş yew şexsî rê û yew demî rê bîyenê giredayene û hewceyo ke rokewîyayê tayê qaliban. Ney pênaseyî ra bi tevger, ma eşkenî vaje karî xoser nêyî giredaye yê. Çunke bi serê xo tena nêyenî şuxulnayiş. Razber û şênber, tevgeranê têgînê ganî û bêganen rê sey giredaye bîyayişê ke xurt benê.

Sewbîna vate rêsey pozîtîf û negatîf rewşa antişî de yê ke têgînê demî kirişeno yan zî pîya têgînê demî rê yê ke têgînê şexsî dana çekuye û çalaki semedê wina karo ke yeno şinasnayiş sewbîna vate ra kerdoxê ey belî bibo yan zî belî nêbo giredayeyê demî yo û mîyanê nê giredayê de ma eşkenî vaje na çalakîye ke pêyena dano zanayiş.

Nimûne: girênayene

Ez awe girênena

Ti awe girênenî/girênena (nêrî/makî)

Her di cumleyan de qertafê şexsî bi -ez û-ti karê girênayişî kamî kenî, qertafê -a û -î karê girênayişî çî wext virazîyayo danê.

Wina aseno ke dayişê tevger yê karî û semedê qezenckerdişê mana ganî qertafê demî û qertafê şexsî bigiro û bişo antişî. Çunke rewşa govde- ristimî de bo mana nêdano nameyî.

Zafî taybetîya karî estî. Ma eşkenî sey mana, awanî, sîwan û mîyanok ney taybetîyan cîya bike, ganî cîya cîya tesnîf bike û etud bike. Her yewina ney taybetîyan de mîyanê xo de taybetîyê binî û beşê înan estî.

Derheqê gramerê Zazakî de etudkerdişo ke ma kitaban de kerdo, bi nêzdîbîyayişê klasîk yê têgînê karî tena şeklê kar, pîyagêrayiş, çalakî de girewto dest û ma dî ke sewbîna erjîyaye nêvirazîyaya. Nê kitaban de tayê kilm pênaseyî dayê. Heto bîn ra serê taybetîyanê awanî û manaye de nêvindetê yan zî binê sewbîna babeta sernuşteyî de bi pêroyî girewto dest.

Heto bîn ra kitabî ke etud bî zafane de Zazakî de karî yewbînan ra zaf cîyayê û ca ca yewbînanî rê şeklo nakokî de girewtî dest.

Goreyê dîyayîşê ma pê pênasayo klasîk yê çend çekuyan qeym nêkeno, babete binayna hîra bidîyo. Heto bîn ra awanîya û taybetîya Zazakî bigire verê çiman, gramerê sewbîna ziwanan Zazakî de ca nêdî ci. Verî de etudkerîşê xoza û awanî Zazakî hewce yo û taybetîyê Zazakî vejîyê orta.

Derheqê babete de taybîyayîşê pênasayan eynî wext de têgînî benî têmîyan ra. Babeta ke etud bena xora dûrî keweno. No semed ra serê babetan de zaf vindetiş hewce yo.

1.2. Zazakî de Qertafê Mesderî

Tayê xebate ke Zazakî de bî qertafê -iş/-yîş şuxulnayo. Tayê xebatanê Zazakî de zî -ene/-yene şuxulnayo. Wina fehm beno ke gramerê Zazakî de di formê qertafê mesderî estî. Sebebê nê cîyabîyayîşan qertafî her mintiqa de cîya cîya şuxulîyenîyo.

Nimûne: "Wexto ke bi **huyayîş** û bi keyf resa taksî hema boya baruî taksî ra amêne."²⁵

Di-hîre **rojî bîyayîşê** aye ra dima..."²⁶

Birayê aye hîre serre verê cû pê **kiştîş** merd.

Jacobson derheqê na babete fikiranê xo wina vano: "Zazakî de mesder qertafê çalakîye o ke tamam nêbîyayo (imperfektif) –en beno ser o ristimê demo vîyarte û ney herfa makî –e taqîb kena û wina virazîyeno. Zazakî de mesderî makî yê, no semed ra her wext qertafê makî –e gênî."²⁷

²⁵ Mehmûd Nêşite, *Çakêto Sipî*, Weşanxaneyî Vateyî, İstanbul, 2012, r. 88.

²⁶ Mehmûd Nêşite, *Çakêto Sipî*, Weşanxaneyî Vateyî, İstanbul, 2012, r. 74.

²⁷ C. M. Jacobson, *Rastnustena Zonê Ma (Dimulki-Kirmancki-Zazaki)*, Vejiyayîşe Tiji, İstanbul, 2001, r. 133.

Ma ney îzahatî rê nimûne bide ;

ristimê demo vîyarte qertafêçalakîye o tamam nêbîyayo qertafê makî
werd -en e werdene

Qisimê ristimî yê karî pê herfêka vengine biqedîyo herfa pêrabestene -y yena beyntarî û halê qertafê mesderî -yene gêna. Ancax ristimê karî pê herfa bêvenge biqedîyo herfa pêrabestene nêgêne. Qertafê mesderî -ene maneno. Na rewşe semedê qertafê -iş zî vîyarena. Qisimê ristimî bi herfa vengine biqedîyo herfa pêrabestene -y yena beyntarî.

Nimûne: da + y + ene da+y+iş
kerd + ene kerd+iş

